



Muqatebûna zarokan li Bernameya Inglîsî bo Koçberên Temenmezin (Adult Migrant English Program)

Gelo pêdiviya we heye bi muqatebûna zarokan bikarin li kursên Bernameya Inglîsî bo Adult Migrant English Program (AMEP) beşdar bin? Dema hûn li kurseke AMEP`yê ne, muqatebûna belaş bo zarokan we yê jêr temenê dibistanê heye.

Pêkhînerê we yê xizmetên AMEP`yê dê hewl bide karê muqatebûna zarokan ya heya 30 xulekan ji mala we yan kursa AMEP`yê amade bike. Renge ev yek herdem mimkin nebe. Pêkhînerê xizmetên AMEP`yê dê hewl bidin cihê herî nêzîk ê muqatebûna zarokan peyda bikin.

Pêkhînerê xizmetên AMEP`yê dê wî cihê muqatebûna zarokan amade bike ku bi destpêka kursa we ya AMEP`yê ra li hev bike. Herwiha, ew ê hewl bide muqatebûna zarokê li rojên hûn li kursê ne dabîn bike, Carinan, renga cih demildest peyda nebin yan renga cihên muqatebûna demkî pêşniyarî we bikin hevdem ji hûn li benda rojên zêdetir bimînin.

Muqatebûna belaş a zarokan tenê wê demê pêk tê ku hûn li kursa AMEP`yê beşdar dibin. Ew bo çalakiyên derveyî kursa we ya AMEP`yê nînin. Dema hûn li kurseke AMEP`yê beşdar nabin, yan we perwerdeya xwe kuta kiribe, hûn divê bixwe karê muqatebûna zarokê amade bikin. Eger zaroka/zarokên we li bernameya muqatebûnê bo ti demekê beşdar nebin, girîng e hûn pêkhînerê xwe yê xizmetên AMEP`yê haydar bikin. Ev bo wê ye ku rezerbûnên ji aliyê zaroka we va rêkûpêk bibin.

Eger hûn gellek kursên AMEP`yê ji dest bidin, pêkhînerê xizmetê dikare cihê muqatebûna zaroka we betal bike. Lê, eger hûn vegerin AMEP`yê, hûn ê dîsan ji muqatebûna belaş a zarokan sûdê wergirin. Lê renga hûn li bendê bimînin heya ku cihê din bo muqatebûna zarokê peyda bibe.

Dema nixandina pêdiviyên muqatebûna zaroka we, pêkhînerê xizmetên AMEP`yê dikare hin bijareyan pêşniyarî we bike lewma hûn dikarin xwendina xwe bi zûtirkê dest pê bikin. Wek mînak, renga ji we daxwaz bikin:

- li navendeke komelî bixwînin ku imkana muqatebûna zarokan lê heye
- ji qasa ku hûn hez dikin zêdetir biçin
- bi mamosteyekî li malê yan bi rêya fêrbûna ji dûr ve bixwînin heya ku cihê muqatebûna zarokê peyda bibe.

Eger amadekirina muqatebûna zarokê pêdiviyên we pêk neyîne, hûn divê vêya bi pêkhînerê xwe yê xizmetên AMEPê ra nîqaş bikin.

Muqatebûna zarokan li Bernameya Inglîsî bo Koçberên Temenmezin

Bo agahiyên zêdetir li bara muqatebûna zarokan, ji kerema xwe bi pêkhînerê xwe yê xizmetên AMEP`yê ra biaxivin.